

Dumahîk : 22 Nîsanê ...

Bêgûmane ku fermana Sultan Ebdilhemîd sebarefî qedexekirina derçûna rojnameya Kurdistan ya berî 111 salan, fermaneke çewt û nemirovane bû. Lê, ji wê demê ta niha, cîhana me ya nûjen gelek bûyerên dilêş û guhertinên mezin di hemî warên jiyanê de dîtine. Du cengên cîhanî yê malwêran rû dane, bi dehê milyon mirovên bê sûc û guneh bi agirê wan hatine şewitandin!! Herweha, derdora 70 salî, şer û nakokî di navbera rista dewletên sosyalîst û sermiyandar de berdewam kiriye, li her çar kenarên gerdûnê mafên mirovan talan û bînpê bûne. Piştî herdu cengên giran, û ji bo mafên mirovan li seranserî cîhanê bêne parastin, Rêxistina Netewên Yekbûyî (UN) hatiye damezrandin, mafê hemî gelan bi şeweyekî fermî parastiye. Herweha, di warê pêşesazî, têkildarî û ragihandinê de jî, cîhanê gavine fireh û balkêş avêtine, pîrensîp û nirxên nû hatine afirandin. Ango, mirov dikare bibêje, sembol û navnîşana vê sedsalê rêzgirtin û parastina mafên gelan û mirovan e.

Lê belê, diltengî û zikreşîya Sultanê Îslamê Ebdilhemîd, sînorên dewleta wî derbas kiriye, hewil daye ku destên xwe yê gemar dirêjî qirika rojnameya Kurdistanê bike, da wê bifetisîne, dengê wê bibire û Kurd bi tenê li vê cîhanê bê rojname, kovar û pirtûk bijîn û bêdeng bimînin...!!

Lê, her û her, rojnama me ya pîroz li ber xwe daye, xwe ji ber tîrên mirinê daye alî û xwe parastiye, tîrêjên zanîne li Kurdistanê belav kiriye.

Vêca, di siha evqas guhertin û bûyerên dîrokî de, çêdibe ev destelatên ku îro gelê Kurd di bin destê wan de ye, têkiliyê bi pîrs û zimanê Kurdî re mîna têkiliya Sultan Ebdilhemîd bikin û ew belge û biryarên rêxistina Netewên Yekbûyî bînpê bikin û qedexekirina zimanê Kurdî bidomînin?!!. Ma li gora kîjan zagonê ev rijîm xwe di çewisandina zimanê Kurdî de mafdar dibînin?!!.

Li welatê me Sûriyê jî, hîna siyaseta qedexekirina zimanê Kurdî berdewam e, rijîma Sûriyê, li rastiya hebûna derdora 3 milyon Kurd ku lê dijîn mukur nayê, bi tundî şerê ziman, folklor û wêjeya Kurdî dike, zimanzan û çalakvanên zimanê Kurdî ceza dike û hewil dide ku vî zimanî ji holê rake. Ew ji bîr dike ku zimanê Kurdî li dirêjîya sedsalan, rehên xwe di hiş û dilê gel de kûr berdane, tu hêz nikare wî ji hiş û dilê gel derîne.

Bi vê boneya pîroz, em hemî rojnamevan, xwendevan, nivîskar, helbestvan, romanivîs û rewşenbîrên Kurd pîroz dikin, hêviya me ew e ku her ew li ser riya hîmdarê rojnameya Kurdî Mîr Miqdad Midhet û Mîr Celadet Bedirxan bi xwîna dilên xwe qelaştine berdewam bin, li zimanê Kurdî yê şêrîn xwedî derkevin û berevaniyê di ber hebûn û pêşvebirina wî de bikin.

Gurzek gul ji giyanê Miqdad Bedirxan û hemî Bedirxaniyan re!

Gurzek gul ji hemî xebatkar, çalakvan û nivîskarên zimanê Kurdî re!

Komîta Rêvebir a Partiya Yekîfî

15.04.2009Z-2621K